Sal 1 — Hejmar 2

Duşemb 10 Gulan 1943

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

# ROJA NÛ

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

## SINÇI U OL

### SINÇÎ (EXLAQ) Û OL (DÎN)

### GIRÊDANA WANA BI HEV RA

Der heqê sinçî da berê û paşê gelek tişt hatine gotin. Heke em van gotinan bînin ber çavên xwe, pê bibînin ko di vî warî da ya ko em dikin bêjin, tiştekî pirî biçûk û bêkêr e. Ji lewra bila neyê bîra xwendevanan ko em dixwazin sinçî ji wan ra salix bidin; an di vî warî da tiştine nû û hêja bêjin. Bi tenê qesda me ji nivîsandina vê bendê, li ser girêdana sinçî û olê peyivîn e.

Sinçî, tevî ko ji tevayiya kirên qenc ra hatiye gotin, di kok da yek be jî di nav hin miletan da bi şax û tilayên xwe ji hev diqete. Carina tiştekî ko di nav miletekî da kirina wî qenc hatiye nasîn, di nav miletekî din da şerm û fihêt e. Lê tevî vê yekê, di her derê da kok yek e û weke xwe hatiye parastin

Dema em li rûpelên dîrokê dinêrin, em dibînin ko di demên berî dirokê da, rê û rêzikên sinçî bi navê Xwedê hatine danîn; ko ji daniyên van rê û rêzikan ra jî pêxember hatiye gotin. Piştî wan pêxemberan, li rohelata dûr Qonfiçiyûs û li ya nêzîk Zerdeştê Kurd; li roava jî Aristo, Suqrat, Felatûn û Zenûn di vî warî da gelek rê û rêzik danîne. Ji van Camêran, herdu seydayên rohelatê Qonfiçiyûs û Zerdeşt dîsa bi pêyembertî hatine nasîn. Lê ên roavayê, bi navên xwe û eqil, hîmên xebata xwe danîne.

Piştî van zanayên mezin jî du ol (olên Îsa û Mihemed) hatine ko îro li ser rûyê erdê, piraniya xelkê xwe bi rê û rêzikên van her du olan girtine.

Pir mirov hene ko sinçî tiştekî û olê jî tiştekî din dizanin; lê ev raman di hindav da e pûç e. A rast ew e ko ol û sinçî yek tişt in; an yek kakil û yê din qalik e. Li ser vê teşbîhê heke em ji van herduyan yekî kakil û yê din qalik bihesibînin, divê sinçî kakil û ol jî qalik bête zanîn. Heye ko ev teşbîha han dilê hinekên têne gihe.-tî biêşîne. Lê ez ji wan celeb mirovan ra dibêjim ko: mirovekî xweyî sinçî bê ol dibe; lê mirovekî bê sinçî xweyî ol (dîndar) nabe.

Di olekê da herçiya ji bo qenciya mirovan hatiye gotin, ew sinçî ye; ji vê pêva ko çi dimîne, ew zêdeyiya olê ya ji sinçî ye. Heke em bi awakî din bixwazin bêjin; di olekê da ji bawerî û nimêjan pêva, herçiya ko heye, bi ser û berên xwe va sinçî ye; an sinçî ji wan tiştan bihevketî ye. Ji vê ye ko bawermendên kîjan olê bibin, çi gava sinçî wenda kirine an berdane; dûmahîka olê ya mayî ji bextereşiyê pêva ji wan ra tiştek çar nę kiriye.

Dema me ev yeka han got, divê em ji bîr nekin ko sinçiyê bê ol jî gelekî dûm nake û nikare xwe paqij biparêze. Herwekî kakilê bê qalik çawan zû qencî û xweşiya xwe wenda dike û kufikî dibe; sinçiyê bê ol jî zû qencî û delaliya xwe bi guhartinên zû wenda dike. Ji ber ko ol rê nade guhartina sinçî û wê di nava sînorên xwe ên zexim da diparêze.

Gelên bextiyar ew in ko piştî naskirinê bi ol û sinçî girtine û ji bo serbilindiya xwe ya sermedî her wan bi çakî diparêzin.

OSMAN SEBRÎ

## BIHNA MIHWERÊ DIÇIKE

### Di nav sê mehan de 466 wapor hatine bin av kirin

Londre —R: Hewalbenda ji wextê ko pê li erdê Efrîqa Bakurî kirine û heta îro di Behra Spî de 466 waporên talyan û elemanî binav kirine; 204 wapor bi derbên noqavan, 29 bi yên waporên rûyê behrê û 233 heb jî, bi torpîl û bombeyên balafiran hatine xeriqandin.

Londre —R: Heta îro 100.000 segman, 12.000 balafirvan û 3,000 deryavanên polonî teniştа hevalbendan de şerî qiwetên Mihwerê dikin.

La Valet —R: Balafirên qerargeha Girava Maltayê heta niha 1001 balafirên dijmin avêtine erdê.

## ÇEK U POSATÊN MEHEKÊ

### 6.000 BALAFIR, 100 WAPOR 3,000 TANG

### Hevalbend bê etlahî çek û Posata çêdikin

Waşington —R: Mr. Nelson serekê şîretzariya emerîqanî a çêkirina çek û posatên şerî elam daye ko fehrîqe û karxaneyên emerîqanî di sê mehên vê salê ên pêşîn de her meh 6,200 balafir, 100 wapor ji tîpê Libertî, her yek ji wan 10.000 ton mezin û 3,000 tang çêkirine. Lê niho destgehên emerîqanî hero 5 wapora çêdikin, li mehekê 450 wapor; 1,606.600 ton mezin.

Moskû — Di nav pênc mehên dawîn de, der nevala Kubanê 15 û heta 20,000 kuştiyên elemanî, serbend û segman pev re, li erdê mane.

Qiwetên Sovyetî li wê qadê 600 balafirên elemanî anîne xwar û bi sedan ve tangên dijmin xira kirine.

Moskû — Serfermandariya sovyetî dide zanîn ko hefta borî refên rûsî û topên balafirşiken 281 balafirên elemanî avêtine erdê; ji ûrisa 166 heb çûne,

## EGIDÊN ORDIYA SOR!

Moskû — R: Şevêdî Radyoa Moskovayê banî Ordiyên sovyetî dikirin û digot: Şerevaniyên Ordiya Sor xwe ji bona êrîşine nû pêk bînin û emrên Serfermandarê xwe Stalîn yek bi yek bînin cih.

### 500.000 SEGMANÊN FRENSIZ

Cezayir — A.F.I. General Jîro nûçegihayê ejensa A.F.I. re da zanîn ko Ordiyên Efrîqa Bakûrî ji 500,000 şegmanan bihevketî ye.

Wî gotiye: armanca me yek e, ev jî azahî û serbestiya welêt.

Londre —R: Refên brîtanî êvara roja çarşembê dirêjî axa Germanistanê kiriye û 1,500 ton bombe avêtine Dortmundê; runiştimanên wê Şaristanê 500,000 peya ne. Heta îro tu bajar bi awakî hinde xurt ne hatiye bombardiman kirin:

## ZOR U ZÊR

Di Ingilistanê de, pêncî milyon rûniştiman hene û ew hero 14 mîlyon lîreyên ingilîzî didin hikûmeta xwe û pê Brîtanya-Mezin şerê xwe bi serdestî pêş ve dajo.

Çek û posatên şerî yên ko îro eskerên her du aliyên şerevanî pê emel dikin gelek biha ne.

Ev e bihayên hin çek û posatan:

Zirehpûşek— wapora şerî a mezintir— ji texlîtê «Rodney» hêja ye 7.750.000 lîreyên ingilîzî. Tangek ji tîpê «Matîlda» 28 ton giran, hêja ye 20,000 L.I. tanga «Velantîn» 15 ton; hêja ye 15,000 lîreyên ingilîzî, û tangek ji tîpê «Çorçîl» bi 29.000 lîreyên ingilîzî tête çekirin.

Bihayê tifingekê 7 lîreyên ingilîzî ye. Cilên eskerekî bi kaxez û nîv û heta 2 kaxezan têne kirîn.

Topeke navhincî hêja ye 3,000 lîre û guleke wê, ji hêla jêrîn ve 8 lîre. Topeke wilo di nav deqîqakê de 12 gulan davêje, ko şeş topên wilo hemî bi hev re şixulîn di nav sê deqîqan de 1738 lîreyên ingilîzî dişewitînin.

Bihayê destriwayorekê — waporeke şerî ji xurtî û mezinahiya dereca çaremîn — 467.000 lîre ye, her topekê wê 6,000 lîre, her torpîleke wê 1,200 lîre.

Waporeke wilo 5 ton ardû dibe; bihayê wê 1.200 lîre; û bi vê ardûyê dikare ji Cebeltariqê rabe û here heta girava Maltayê.

Bihayê noqavekê 250,000 lîre ye. Korvêtek — waporşereke biçûk hêjaye 150.000 lîreyên ingilîzî.

NEZANÎ



XERABÎ Û PERÎŞANÎ

Nezanî ne rahetiya canî ye, lê belê xirabiya malê. Dermanine biçûk hinik zanîn; gelek caran zora nexweşiyên mezin dibin, Ji xwe Xwedê gotiye: min derd û derman afirandine.

ZANÎN



XELAS Û XWEŞÎ

Beytarekî frensiz arîkariya gundiyan dike: ev derziya ko wî lêdix e ne pezekî lê keriyên pez û garanên dewaran ji nexweşî û perîşaniyê diparêze.

XWEŞÎ



FIREHÎ Û DEWLEMENDÎ

Dermanî pişta nesaxiyê şkênandiye; pez vegeriyane xweşiyê, rûyê gundiyan keniyaye.

Nezanî ne bitenê keriyên pez û dewaran, lê mala mirov û miletan jî xira dike.

## Bombardimana Dortmundê

### REFÊN BRÎTANÎ JI NÛ VE ÊRÎŞ KIRIYE

Londre — R: Refên brîtanî şevtira dî bi ser erdê Germanistanê de girtiye û li bajarê Dortmundê xistiye. Refên brîtanî ji bombeavêjên Helifeks, Sterling û Welington bi hevketî bûn. Wan bi hezaran qumbereyên teqandinê, û bombeyine mezin her yek ji wan 4,000 kilo giran avêtine vê şaristanê,

www.arsivakurd.org

# DURIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ



## NARE

Navê Nara min Sarê
Çavre.ê ser bi şarê
Xwedê ji Paşê nexweş bê
Esker rakir ji Darê !

Navê Nara min Fato
Kimberzîvê ji Toqato
Xwedê ji Paşê nexweş bê
Esker rakir ji welato !

Navê Nara min Sîso
Kimber berda ser kîso
Xwedê ji Paşê nexweş bê
Esker rakir ji Bidlîso !

Navê Nara min Xorê
Çavreşê destmalsorê
Xwedê ji paşê nexweş bê
Esker rakir ji Torê !

Navê Nara min Eminê
Çavreşê destmalşînê
Xwedê ji Paşê nexweş bê
Esker rakir ji Merdînê,



## HEYNAYE

Heynayê lê Heynayê
Ez ban te dikim, çima nayê
Lingê min xistin qeydayê
Stoyê min xistin lelayê
Destê min xistin kelepçayê
Berê min dane serayê.

Heynayê lê Heynayê
Tama memkên te xweş in
Wek xurmayê Bexdayê
Wek hejîrê Rihayê.
Heynayê lê Heynayê.

Xwedê o xweş Xwedêo !
Kengê her û kengê bêo !
Tu gewra min rakî ji xewêo !
Çavê min lê ket bejneo
Xulam bejn û balêo.
Ezê bi çeplê te bigirim
Bavêm gundê Herbêo
Cem Mehmûdê Korêo

Xwedê o tu bakî rakî
Gewra ji xewê rakî
Bazina di desta kî
Xilxala di linga kî
Eyûna di ber riwa kî.
Xizêma di poz ra kî;
Tu qîza behra xorta kî
Ez terka çavê reş na kim
Heya qiyamet rabe
Pêwir û mêzên l'me dayê.

# Dema Dawîn

Londre — Qiwetên hevalbenda zora leşkerên Mihwerê birine û ketine bajarên Bizert û Tûnisê. Hawîrên selahiyetdar elam didin ko şerê Efrîqayê qediyaye û şerê Ewripayê ber bi destpêkirinê ye. Heta niha 50.000 esker û serbend 3 generalên elemanî ketine destê Hevalbenda.

Moskû — Êdî Ûrisa rast bi rast êrîşî bendera Novorosiskê dikin; di bakur - rohelatê vê şaristanê de şerine zor û xwîndar çêdibin, ji xwe Novorosisk bi xwe, êdî di bin hikmê topên Ûrisa de ye, ji alîkî topçiyên rûsî û ji aliyê din yekineyên çekê sovyetî ê hewayî bê etlahî vê benderê bombardiman dikin. Nûçeyên dawîn pêş çavan dikin ko di vê qadê de tasa şihîrê ber bi Ûrisa ve giran bûye û leşkerên rûsî der gelek cihan, xetên elemana neqeb kirine, ketine çeper û penahên di wan û di ser vê eniya şerî re, li ezmanan girtin û berdan bi timamî ketiye destê refên Ordiya Sor; û li bejê her çend ji elemana bi hemî xeyretên xwe dikirin pê bidin erdê û zorbiriya qiwetên rûsî bikin, ji wan ne hatiye ko pêşveçûna lekên şerevaniyên rûsî bisekinînin; wan berê xwe daye Novorisiskê û peşve tên.

Londre — Ordiya elemanî di axa Tûnisê de ketiye nav sêgûşeke bê eman û bê niyaz, ji her du aliyên bejê mina berfendeyên çiyabejin Ordiyên hevalbenda bi ser wan de tên û ber na din ko eskêrên elemana çavê xwe vekin û bihna xwe bistinin. Êrîşên hevalbenda ên xurt dijmina di hemî qadan de û bê etlahî bi şûnda dizivirînin û̂niho di nav bira yekineyên hevalbenda û Bizert û Tûnisê de mûyek maye.

Londre — R: Bi awakî resmî didin zanîn: Di balafirgeha Ueynetê de sed balafirên elemanî û gelek talyanî yên xirabuyî hatine dîtin.

# ÇAPA KURDÎ

### KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

Roja-Nû ya ko nû dikeve nav eyleta çapa kurdî, silavan li hevalên xwe ên jê kevintir dike û hilanîna navên wan ji xwe re wezîfeke hevaltiyê dinase.

Kovar û rojnameyên kurdî yên ko îro belav dibin ev in:

Reya-Teze : Li heftê sê caran û li bajarê Rewanê belav dibe; rojnameya kurdên Sovyetistanê ye. Bi zar û bi tîpên kurdmancî tête nivîsandin.

Jiyan : Kovareke edebî û ilmî ye; li serê her heftê carekê û li Sileymaniyê bi der têt. Bi zarê soranî tête nivîsandin.

Gelawêj : Kovareke edebî û ilmî ye. Li serê her mehê carekê li Bexdayê derdikeve. Zarê wê soranî ye. Kovara Kurdî a mezintir û tekûztir e.

Hawar : Kovareke edebî ye. Ji sala 1933-an ve li Şamê û bi zarê kurdmancî tête belav kirin.

Ronahî : Ev du sal in, li Şamê dest bi derketinê kiriye. Zarê wê kurdmancî ye. Ronahî kovareke mişewer e û li serê mehê carekê derdikeve.

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ



ZAROYÊN INGILISTANÊ

Brîtanya Mezin giravek e û heke riyên dinyayê ên behrî, ne di selametiyê de ne, Ingilistan dikeve perîşaniyê. Ev ingilîzên biçûk di zarokahiya xwe de dikevin dibistanan û hînî gerandina karên Stola Brîtanî a qehriman dibin. Selametiya rêyên dinyayê bi waporên şerî têne parastin.

Zaroyên ingilîzî berê xwe dane dibistanê û bi kêfxweşî dimeşin



ZAROYÊN DELAL KETINE DIBISTANÊ
Û DEST BI XEBATÊ KIRINE



QRALÊ YUGOSLAVYAYÊ

Qralê Yugoslavyayê Piyer Qralê Ewripayê ê ciwantir e. Ji bona azahî û serbestiya welatê xwe ketiye riya mihaciriyê û xwe gihandiye hevalbenda, û hatiye Londrê. Xortê bi cilê eskerî Qral bi xwe ye.

www.arsivakurd.org

1ère ANNEE — LUNDI 10 MAI 1943 — NUMERO 2

# LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Quatrième printemps de guerre

Au printemps de 1940, après 8 mois de «drôle de guerre», se déclenchait en deux temps la bataille de l'Ouest. Les Allemands occupaient la Norvège avant que les Alliés surpris, aient pu leur opposer une résistance efficace; quelques semaines après c'était l'invasion de la Hollande et de la Belgique, la campagne de France, l'armistice, les terribles bombardements contre l'Angleterre et la menace de débarquement. Des hommes politiques réputés très fins, des militaires à la carrière prestigieuse ont cru alors à la victoire allemande; Mussolini aussi qui a lancé son pays dans la guerre. L'automne et l'hiver nous donnèrent cependant quelques raisons d'espérer: autour du Général de Gaulle se cristallisait la volonté de résistance des Français; l'Angleterre tenait et Wavel refoulait les Italiens jusqu'à Bengazi.

Printemps 1941.— C'est la guerre éclair dans les Balkans: en quelques jours la Yougoslavie est écrasée; la croix gammée flotte sur l'Acropole, les Allemands commencent la conquête des Iles et après une terrible bataille s'emparent de la Crète.

En Afrique, Rommel parti au secours des Italiens, rejette les Anglais jusqu'en Égypte; on commence à parler de la fameuse pince; l'Iraq se soulève, la campagne de Syrie s'avère difficile. Le premier jour de l'été, la Wehrmacht s'enfonce dans les plaines de Russie, ceci redonne de l'espoir aux ennemis de l'Allemagne, mais les formidables victoires des nazis font naître l'inquiétude. Au moment où le front était stabilisé à Rostov, où les Anglais étaient retournés à Bengazi, l'entrée en guerre du Japon qui amène en 60 jours les Jaunes à Java et à Singapour coupe les ailes à bien des espoirs. La propagande ennemie parle de la jonction vers l'Inde des troupes nippo-allemandes.

Printemps 1942.— Après le terrible hiver l'attaque allemande tarde à partir; sur le front nord elle porte les nazis aux cols du Caucase, à Stalingrad, à Ellista. Rommel cette fois passe en Égypte et la vague arrive à El-Alamein. Mais, l'automne et l'hiver 42-43 voient le terrible désastre de Stalingrad et la reconquête du Caucase, la belle victoire de Montgomery dans le désert de l'Ouest, les terribles bombardements de l'Allemagne, le débarquement américain en Afrique du Nord, les magnifiques exploits de Leclerc «le conquistador». Les conférences de Casablanca et d'Adana, la bonne marche des negociations Giraud — de Gaulle nous préparent le printemps le plus favorable de la guerre.

Aujourd'hui, au milieu du 4ème printemps de guerre, les Alliés viennent de prendre Tunis et Bizerte et dans quelques jours il n'y aura plus un ennemi en Afrique. Les Russes vont s'emparer de Novorossisk, dernière tête de pont vers le Caucase, la Wehrmacht est partout sur la défensive et partout on s'agite à l'intérieur de la «forteresse Europe». Le partenaire italien s'inquiète de la menace qui se précise, les satellites sont las et le plus comblé, la Bulgarie, à qui l'Allemagne a donné d'immenses territoires sans pouvoir lui faire tirer un coup de fusil, est le moins sûr.

Certes, il ne faudrait pas faire preuve d'un optimisme exagéré quant à la date de la victoire. Des hommes comme Churchill se chargent de nous mettre en garde. Mais au 4ème printemps de guerre la victoire apparaît comme certaine; la Wehrmacht peut encore nous réserver des moments pénibles, mais quel que soit le succès qu'elle peut remporter, ce ne sera plus que le chant du cygne.

*A partir de Lundi prochain, rubrique hebdomadaire ds la guerre «Vers la Victoire».*

**E. B.**

## LES RAIDS DE LA R.A.F. sur l'Allemagne

Un correspondant suisse qui a eu l'occasion d'assister à l'une des premières attaques de la R. A. F. contre Berlin décrit comme suit les impressions qu'il y a recueillies.

«L'alerte a été donnée. On n'a plus le droit, en 1943, d'ignorer ou de minimiser l'importance de ces raids de la R.A.F. Il faut chercher un abri. Au loin, on entend tonner la D.C.A, et peu après le grondement des bombardiers britanniques.

«On court d'une chambre à l'autre; on ouvre portes et fenêtres qui sont fixées au moyen de crochets ou d'objets lourds. Peut-être sera-t-il possible, ainsi, d'éviter l'éclatement des vitres. On se hâte de rassembler les objets les plus précieux: documents, bijoux; on arrache les couvertures des lits pour ne pas trop grelotter en bas, dans la cave. On se précipite à la cuisine pour y prendre un peu de pain, de saucisson ou de fromage: peut-être n'aura-t-on rien à manger pour plusieurs jours. Il ne faut pas oublier non plus quelques bouteilles d'eau: après le bombardement précédent, des quartiers entiers de la ville sont restés plusieurs jours sans eau. Nous quittons précipitamment la maison pour nous rendre dans l'abri public, en passant par le jardin, et nous voyons au loin le merveilleux spectacles des projecteurs qui balayent le ciel de leurs rayons.

«Dans l'abri, on cherche tout d'abord à se donner du courage. On veut minimiser l'importance des raids aériens. Mais bientôt, les voix se taisent. Tout le monde sait que ce n'est plus l'homme, mais le Destin qui parle aujourd'hui. La D.C.A. crèpite. Des bombes incendiers et explosives éclatent à de brefs intervalles. Cela doit être tout près, car la déflagration est tellement forte qu'il est impossible de se tenir debout dans l'abri. On entend des craquements et un cliquetis provenant à la maison. Jamais cela n'a été aussi sérieux. Puis, l'odeur suffocante des incendières . . . et le bruit des bombes qui tombent de plus belle Et cela continue pendant cinq. dix, vingt, quarante minutes, sans interruption: bombes, D.C.A., avions, mitrailleuses . . .

«Pendant une accalmie on remonte dans l'appartement, rendant grâce au Ciel que les dégâts ne sont pas plus considérables dans ce quartier de la ville. Les vitres sont en miettes: il faudra vivre 5 ou 8 semaines dans les courants d'air et grelotter de froid. Mais par les fenêtres on voit rougeoyer des incendies: d'énormes flammes dansent vers le ciel, activées par le vent. Il faut empêcher que le feu ne gagne la maison.

«On parle, on discute de tout et de tous. Mais secrètement chacun écoute encore la voix intérieure, les battements de son coeur et respire avec difficulté, car il sait que la Mort a plané sur lui. La mort la plus affreuse, contre laquelle même le plus fort est impuissant. On se sent voué la Mort, on la sent encore dans chaque nerf, et l'on ne peut rien faire d'autre qu'attendre ce que le Destin apportera. La terreur d'un tel raid est trop profonde pour pouvoir être décrite par des mots.

## POÈME KURDE

### L'ORPHELINE

*Viens, allons ensemble*
*Au fonds des bois*
*Où se cachent les débris de la nuit,*
*Où les feuilles fanées forment un lit*
*Plus beau que l'alcôve d'un roi.*

*

*Nous irons jusqu'au point*
*Où la lumière va nous perdre,*
*Où rien ne peut nous suivre*
*Pas même l'ombre de nos pas.*

*

*Dans cette splendeur noire*
*Je veux voir*
*Tes yeux.*

*

*Le bruit sera loin de nous,*
*Quand j'entendrai dans ta poitrine*
*La voix douce de ton âme:*
*Cette orpheline*
*Qui a déjà des cheveux blancs.*

DR. BEDIR KHAN

## LES DEPECHES de la NUIT

**Londres** (A.F.I.): — Les forces ennemies d'Afrique du Nord se retirent vers le Cap Bon dans un désordre complet, abandonnant de grandes quantités de matériel sur les routes. Les troupes alliées talonnent de près l'ennemi en déroute. Développant leur avance, les Français ont progressé au delà de Moghran. Le nombre des prisonniers augmente d'heure en heure. 50.000 soldats et officiers ennemis ont déjà été dénombrés. On compte parmi eux 3 généraux de divisions allemands.

**Alger** (A.F.I.): — Au cours de la cérémonie qui a eu lieu avant-hier à Alger à l'occasion de la fête de Jeanne d'Arc, le Général Giraud et le Général Catroux, représentant le Général de Gaulle, ont déposé des couronnes au pied du Monument du Soldat Inconnu.

**Washington** (R): — Le Président Roosevelt a adressé au Général Eizenhower un message de félicitations pour la victoire des armées alliées en Tunisie. Le Président a adressé d'autre part un message au Général Giraud disant notamment:

«Je vous exprime l'admiration du peuple américain pour la contribution brillante des forces françaises sous votre commandement qui a abouti à l'occupation de BIZERTE et de TUNIS. Les soldats français ont prouvé qu'ils n'attendaient qu'une occasion pour repousser leurs oppresseurs allemands Ce précédent si victorieusement établi annonca le jour où les Nations-Unies travaillant de concert, rendront la France à son peuple.

**Moscou** (R): — Radio Moscou a annonce tard cette nuit que les bombardiers soviétiques, au cours de plusieurs raids sur les lignes de communications allemandes, ont attaqué Briansk, Poltava. Bielgorod et d'autres bases ennemies. De nombreux terrains et locomotives ainsi que des camions chargés de ravitaillement et de munitions ont été détruits. Pendant ces opérations 75 avions allemands ont été abattus 21 avions soviétiques sont portés manquants.

**Moscou** (R): — Les Russes continuent à excercer une très forte pression sur Novorossisk, élargissant la brêche grâce à laquelle les Allemands tenant cette tête de pont ont été coupés de toutes communications avec l'extérieur.

Vient de paraître
HISTORIQUE SOMMAIRE
DU
CHAR DE COMBAT
LE MAITRE DU CHAMP DE BATAILLE
par le
Commandant L. FOUQUET
des F. F. L.
Ouvrage édité et diffusé par les soins du SERVICE de PROPAGANDE des FORCES FRANÇAISES COMBATTANTES en MOYEN ORIENT
Dans toutes les librairies

*Provisoirement,* LE JOUR NOUVEAU *paraîtra une fois par semaine, le Lundi,*

# SER ENCAM

Gava meriv ji halê xwe ne razî, û ji pêşiya xwe bigûman be, dizîvire, li rojên xwe ên derbasbûyî dinêre... mîna pîrên riziyayî ko ne ji dixwazin bimirin... tenê û tenê li rojên xwe yên çûyî bifikirin; xortaniya xwe, zarotiya xwe bînin bîra xwe û bi vî awayî bîna xwe biderxin...

Ez jî wisan bûme; ez jî bûme xortekî pîr. Li pêşiya xwe denêrim: leylan û gûman... Li dora xwe mêze dikim; mij û dûman!...

Belê, ez jî mîna wan kal û pîrên xurde, rojên xwe ên derbas bûyî, nemaze rojên zarotiyê tînim bîra xwe, bi hezar û yek hesretî dilê xwe tije dikim û ji wan lezeteke derûnî distînim... Ew pelên ko ji kitêba jiyîna min hatine çirandin, îroperçên wan î riziyayî berev dikim, bi hev dizelqînim... dixwazim ji wan, kitêba bextiyariyê çêbikim. Sond... Guneh... Rojên derbasbûyî... Serencam... her yek ji van, ji kitêba jiyîna min a hezîn rûpelekî rengîn in. Lê rengîn dibin, zengîn dibin... dîsa pelinin çiriyayî û rizyayî ne... Serencam jî rûpelek ji wan pelan e...

Berî bîst û pênc salan bû... Bi meh û hefteyên xwe, bi şev û rojên xwe, bîst û pênc sal... Di nav hundirê mala me de, ji nişkave, hay û hûyek çêbû; birayê min Fethî, piştî nexweşiyeke pir kin, nexweşiyeke du sê rojan dimir... Ew şîn û girî ji bona wî bû.

Fethî, sal û nîvekê ji min biçûktir bû... çavreş; rûgewr... ji min bilintir û girtir bû...

Ez, ji her kesî bêtir, li ber mirina wî diketim him ji ber hezkirina xwe, him jî; ji ber gunehê ve... Min, xwe ji ber mirina wî mes'ûl û gunhekar dizanî bû...

Li welatê me adetek heye; Her kes fêkî û êmîşên xwe ên ko ji havînê û payîzê de, dicivînin dixin den û kûpan, derê wan diseyînin û di ser salê de deriyê wan vedikin... Ne hişk dibin ne kevin... mîna berê ter û taze dimînin... Wê salê me jî mîna her gav êmîşên xwe yên zivîstanê hilanî bû... heft, heşt denên mezin lebaleb tije bûn û derî seyandî bûn. Êvara sersalê mala me ji dost û malbatê tije bû... zarokên biçûk bi meraq li benda merasima vekirinia denan bûn.

Gava diya min çû mexzana êmîşan, denekî dev-vekirî û hundirvala dît... Bi ruyekî tirş bi milê min girt û ez hejandim ... hêj ji min tiştek ne pirsî bû, min got: Fethî... Fethî, deriyê den vekir û sincok û kêsme li zarokên taxê belav kirin;..» Fethî, ne liwir bû, çû bû sersala meta xwe ..... Di vegerê de, diya min ew girt û dû şimaqên bi tîn li ruyê wî xistin... Reben, haya wî ji tiştekî tune bû; hingûr, hingûr giriya...

Deriyê den min vekiri bû, û min bi destê xwe êmîşê hundirê wî, hêdî hêdî, kişandi bû... lê ne jî bona xwe, ji bona çîrokbêja gunehkar; Xecê...

Xecê, pîrejineke çîrokbêj bû... du sêwiyên wê hebûn: yek keç bû, yek jî law... Xecê, xwe û sêwiyên xwe, bi çîrokan xwedî dikir. Her êvarên Zivistanê hundirê mala wê, ji zarokên mîna min şeş-heft salî, tije dibûn... Xwarin, vexwarin, şêranî, cîxare û gaza wê li ser me bû... Wê salê êmîşên wê li ser min bû... Her êvar min, dê û bavê xwe dixapand, min di got: ezê herim cem hevalê xwe yê Dibistanê Xurşîd... bi wî re dersên xwe bixwînim. Ji wir, di dehlizeke teng û tarî re min xwe digihand denê êmîşan û min bêrikên çakêt û paltoyê xwe tije sîncoq û kêsme dikir û min dibir li ber çîrokbêja xwe vala dikir. Her tim, ji min re digot: aferîn kurê min, aferîn!

Hetanî guhdarên wê temam ne biwana, Xecê, dest bi çîrokan ne dikir... Ewilî, çavên xwe li dorê digerand û digot:

—Sado li vir e?... Remo kaniye?... Kanî Cemo???...

Mirîd, yek bi yek hazir dibûn... wê jî dest bi çîrokên xwe dikirin... Ne ew diwestiya, ne jî em têr dibûn... Gava nuh dest pê dikir dengê wê hêdî, hêdî derdiket... Ji bona ko em rind bibihîzin, me xwe bi erdê re kaş dikir û me dixwest em nêzîkî wê bibin... Paşê ne hewce bû, herke diçû dengê wê bilind dibû... heyecan di hatê... em jî mîna wê bi cezbê diketin, dest û lepên me, bê hemdê me dilivîn... Wê gavê qurmên daran jî, di hundirê kuçik de çiz çiz dişewitîn... Germa êgir û hilma zarokan hundirê xanî dikir mîna hemamê... Xecê, cîxarek ji cixarekê vêdixist û kûr dikişand qiriqa xwe... dûmana cixarê ji bêvila wê, pêl-pêl derdi ket... paşê digot: Belê, em ha tin kûderê... «Mîrza Mehemed, xortekî bîst salî bû... di xewna xwe de keça padişahê periyan dît:.. Ji bona evîna wê, terkî dinya bû... li ser riya wî heft dêw hebûn... bi şûrê xwe [illegible]yê du-neçel serê wan yek bi yek jê kir..»

Xecê, heta nîvê şevê ji me re çirokên dêw, perî, cin û ejderhan digot û me jî bi can û dilê xwe, guhdariya wê dikir û em ji qehremanên van çirokan re heyran di man...

Min, pir ji çîrokên dêwan hez dikir... min, di dilê xwe de di got: ah! xwezî ez jî rojekê mîna «Mîrza Mihemed», qehremanê çîrokê dêwan bibûma û şûrekî min jî du neçel hebiwa,.. giyanê min ji ber van efsaneyan dihejiya, dilê min bi van serguzeştan malemal dibû...

Piştî ko Fethîyê bê guneh ew her du şimaq ji diya xwe xwarin, çû bû quncikeke odê rûnişt û poniji... Sibehê Fethî, bi take germ ket; nikarî bû ji nav cihên xwe rabe... sibetir, ta wî girantir bû; devê wê ne digeriya... Bavê min tixtor anî ser... tixtor, derman dayê û got: nexweşiya wî ne tiştek e, grîpeke sivik e...

Lê efsûs! roja sisiyan birayê min î delal çavê xwe, bi yekcarî, li me girt û em di nava şîn û girî de hiştin...

Belê, ev bûn bîst û pênc sal... ev serencama hezîn, jiyîna min jehirdayî dike... ez jî, di dilê xwe de, li wê pîrejinê, li wê çîrokbêja gunehkar û xwînî, hezar û yek nefretî dikim...

Lê tenê, — heke ne miri be — dîsa dixwazim carekê wê pîrê bi bînim û jê re bêjim;

Ez jî bi evînê ketim... min ji çiyayên qaf derbas kirin... ez jî ketim nav dêw û ejderhan û bi wan re pence-pence şer dikim... tenê tiştek ji min kême; Şûrek... mîna şûrê «Mirza Mihemed» ê du-neçel...

Cidêde: 14-4-943

QEDRÎ CAN

# PÊJINÊN DINYAYÊ



LEŞKERÊN FRENSA ŞEREVANÎ

Ji çar aliyên cihanê xortên Frensê tên arîkariya welatê xwe; û gava frensîz dibêjin «Frense» tu ronahî li çavê wan na mîne.



GIRTIN Û BERDAN

Êdî di ezmanan de girtin û berdan destê balafirên Hevalbenda de ye.



BERGEHEK JI KIŞWERÊ FRENSIZÎ

Çiyayê bi nav û deng Silaos; bergehek ji komgirava Reunyonê.



DIEGO SUAREZ

Bendera Madageskarê a mezin; giravek ji Kişwerê Frensizî.

IMP. LE MIROIR D'ORIENT · BEYROUTH